

Bacên PYD rewşa welatîyên Kurdistana Sûriyê zehmetir kiriye

Kurdistan



Rêveberiya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD li Kurdistana Sûriyê bacên salane li ser xwedanên dukanan zêde kiriye, û ev yek jî bargiraniyeke zêde li ser wan dirust kiriye, ji ber

vê yekê li bajarê Qamişlo dukandaran dukanên xwe ji bo demê wek nerazîbûnekê girtin û daxwaza kêmkirina baca salane kirin. Rojnameya Kurdistan li ser vê mijarê nerîna hin dukandar

û welatîyan wergirt. Dukandarek wiha dibêje, bacên ku rêveberiya PYD ji me distîne gelekî zêde ye û ev yek bargiraniyekê li ser me dirust dike, jibîlî kirya dukanê û xerciyên me û giraniya heyî, bi

rastî ev biryar dihêle ku xelk zêdetir koçber bibin. Dukandarekî din jî dibêje, bac û pereyên ku PYD û dezgehên ser bi wê ve ji xelkê distînin rewşa xelkê têk daye, û heger ne ji tirsba ba wê berdewam

xwepêşandan hebana, xelkê dilgiran e, lê ji tirsba hêzên ewlekariya PYD nikarin tiştêkî bikin û gef li wan tê xwarin.

Aloziyên li Qamişlo, Heseke, Eşrefiyê û Şêxmeqsûd sînyaroye ne û armanc jê veşartina rewşa xeraba abûrî ye

Kurdistan-Siwar Ebdulîlah

Wek bersivê li hember dorpêçkirina taxên Eşrefiyê û Şêx Meqsûd ên Helebê (taxên Kurdan), hêzên HSD û asayîşa PYD çargoşeya ewlekariyê li Heseke û Qamişlo dorpêç kirin û Rûsya jî navbênkariyê di navbera her du aliyên de dike. Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yê Helebê, nêzîkî 200 hezar kes lê dijîn û piraniya wan niştecihên wan Kurd in û di destê hêzên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD de ne. Firqeya Çarem a rêjîma Esed ji roja 13ê Adara borî ve xalên pişkinîne danîne û ew her du tax

dorpêç kirine û rê nadin sotemenî û madeyên xwarinê û bi taybetî ard derbasî taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê bibin û xelkê di rewşeke gelekî zehmet de dimînin. Wek bersivê li ser vê dorpêça Eşrefiyê û Şêx Meqsûd, ji çend rojan ve alozî li Qamişlo Heseke di navbera hêzên HSDê û asayîşa PYD ji aliyê hêzên rêjîma Esed ve derketiye. Hêzên HSDê û asayîşa PYD jî navendên rêjîma Esed li Qamişlo û Heseke dorpêç kirine. Hêzên HSDê û asayîşa PYD hejmarek rê û kolanên sereke yê bajêr girtine û rêbendên xwe li nêzîkî çargoşeya ewlekariyê ya ku sazî û dezgehên rêjîma Esed lê ne, danîne. Ji aliyê xwe ve, Parêzgarê Heseke

Xesan Xelîl ji medyaya ser bi rêjîmê re ragihandibû, ji ber dorpêça HSDê, êdî madeyên xwarinê derbasî deverên wan nabin, madeyên li cem wan embarkirî bûn jî êdî ber bi nemanê ve diçin û ew niha di rewşeke xirap de ne. Parêzgarê Heseke amaje bi wê yek da, niha hêzên Rûsî ji bo çareserkirina rewşê û rakirina dorpêçê, navbênkariyê di navbera wan û HSDê de dike. Welatîyek derbarê van aloziyan ji Rojnameya Kurdistan re wiha ragehand, aloziyên ku li Kurdistana Sûriyê di navbera asayîşa ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD û hêzên rêjîma Esed rû didin li cem xelkê gelekî asayî

bûne, ji ber salane du sê caran dubare dibe, û ev yek jî dilgiraniyê li cem welatîyan dirust dike û dibe sedema têkdana jiyana welatîyên sîvil û madeyên sereke yê jiyane bi zehmetî bidest wan dikeve, herwiha gelek kesên bê guneh jî dibine qurbanî ji ber şer û aloziyên ku rû didin, lewma pêwîstî bi çareseriyê jî vê rewşê re heye, lê bi nerîna min ev yek ti carî çareser nabe û herdu alî jî sûtê jê werdigrin û bi rûdana aloziyan cemawerên xwe zêde dikin û xelkê bi aliyên xwe ve tînin heta ku hezkirina wan bidest bixin. Welatîyêkî din jî wiha dibêje, rewşa niha xwe li

ber şer û aloziyan nagre û rewşa abûrî ya welatîyan gelekî xerab e û xelk jî nêza dimrin, ne kehrebe, ne av, ne xaz, ne madeyên sereke, û bi ser vê rewşê de şer û alozî hene, bi nerîna min ev sînyaroye û herdu alî jî çî rêjîma Esed û çî PYD dixwazin gendelî û rewşa abûriya xerab û diziyê veşêrin, û bihêlin ku xelk mijûlî aloziyan bin û bîr li nan û debara jiyana xwe ya rojane nekin, û ev çend sal in herdu alî li ser vê yekê kar dikin, ew dixwazin xelkê mijûl bikin. Welatîyek dibêje, xelk jî şanoyên herdu aliyên bêzar bûne, û dixwazin ev alozî bidawî bibin û rewşeke xweş derbas bikin.



Belgehkirina binpêkirinên PKK li Kurdistana Sûriyê di nava pirtûkekê de

Soz Mihemed


Pirtûka nivîskar û çalakvan Mahir Hesen ku bi Zimanê Erebî ye û di jêr navnîşana "Abîrûn Min El-Şemal" derket ku ev jî xwendinek li ser naveroka pirtûkê ye. Li Kurdistana Sûriyê belgehkirina binpêkirinê nayê zanîn ji ber rêgirtina li hebûna rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên civaka sivil ji aliyê PKKê ve, ji ber vê yekê karê belgehkirinê û tomarkirina bêtaran mijareke li ber çavaye û nabe bê girtin û divê di çapemeniyê de bîn weşandin.

Bi zêdebûna berdewam a hejmara qurbaniyan û revandina zarokan ji aliyê PKKê ve, pêwîst bû ku rola rasteqîne ya belgehkirina yasayî ya van binpêkirinê aktîv bibe, lewra çendî rêxistinên mafên mirovan hatin damezrandin ku di vî warî de kar dikin, lê karê wan dîsa lewaz e ji ber fişara PKKê û gefxwarina terorkirina endamê rêxistinê. Ev Pirtûkek ku tê de hûrgiliyên herî biçûk ên damezrandina partiyêke siyasî bi mebesta balkişandina ciwanan ji bo xizmetkirina sîstema PKKê û bidestxistina armancên kesayetî. Ji dema ku Ocalan reviya ji Tirkiyê dest bi organîzekirina çalakiyên xwe li hundirê Kurdistana Surî kir û hewl da ku partiyêke siyasî tenê bi Kurdên Sûriyê re ava bike, çawa ku di pirtûkê de hatiye belegekirin ku efserekî Sûriyê ji Şaxa Îstixbaratê weke sekreterê partiyê hat destnîşankirin, lê ev yek neçû serî. Pirtûk wisa li ser geşbûna PKK bi lîstikên lawaz û diyar, herêmên Kurdan radest kir û bi hişê hogir û hevalbendê xwe yê ku nezanin li ser peywendiya wan bi


rejîma faşîst re dikene û dest bi operasyonên îşkence, destdirêjî, kuştin û sirgûnkirina siyasîmedaran kir. Herwiha tede hatiye nivîsandin li ser bac û periyên ku bi darê zorê ji xelkê dihat standin bi armanca belavkirina terorê û berfirehkirina bingeheên xwe yê girseyî li Kurdistana Sûri piştî ku hema hema bi dawî bû. Di vê pirtûkê de belgeyên dîrokî li ser revandin, kuştin û girtina sivilan heye, ji bilî belgehkirina navên bi dehan zarokên biçûk ên dibin temenê 18 salî yê ku ji aliyê Konseya PKKê ve hatine revandin. Di derbarê idiyolocî û diruşmên partiya nav bûrî de jî zelalkirin û hewldanek hatiye ku tiştêkî ku Kurdbûna herêmê nîşan dide tune ye û li ser bikaranîna vê siyaseta plankirî tede hatiye tekez kirin. Tevî vê yekê di destpêkirina desthilatdariya PKK li Kurdistana Sûri di dawiya sala 2011an de, şeweyên curbicur yê binpêkirinê ku ji aliyê dezgehên PKK ve li dijî mîletê Kurd pêk dihat, dest pê kir, û veguherî binpêkirinê ku bi şeweyekî sîstematîk

têne kirin û bi fermana Konseya PKKê, bi taybetî piştî ku ENKS derbasî qonaxa navdewletî bû, ev yek jî ji bo PKKê bûye cihê dîlnexweşiyê ku veguherî şerê çekdarî yê navxweyî bike. Ev pirtûk ku belgehkirin, tomarkirin û arşivkirina binpêkirinê bi awayekî rast bingeha ku dadweriya veguhêz bi rast û durust destpê bike tevî ku ne pirtûka yekem e, lê zanyarî ji devê kesên ku hatiye îşkence kirin li ser destê PKKê hatine belgehkirin, û li gorî dinyayê tevayî belgehkirin nemaze prosedurên ku beşa yekem a dadweriya veguhêz, ku lêgerîna rastiyê û dadmendiyê, pêk tîne. Ji encama pirtûkê ku piroseya belgehkirina binpêkirinê ewqas girîng e ku dikare wekî bingehek were ku dê pêvajoyên berpirsiyariyê yê pêşerojê li ser bîna avakirin û mijarên qanûnî û sivil vegeerînin rewşa wan a asayî, û paşê ber bi rewşeke nû ve biçin. ku dadmendî û wekhevîyê ji bo hemû kurdan bê û sînorek ji bo kar û kiryarên PKKê bête danîn. Armanca belgehkirinê, ew e ku hurgulî, amûr û agahdariya ku em lê digerin diyar dike, û ji ber vê yekê dibe ku pirsê herî

girîng ji bo her saziyekê ev e ku çima belge dikin û ji bo çî armancê ne? Ji ber ku kêşeya belgehkirinê ne pirseke teknîkî ye, lê ji nêzîk û bingehî ve girêdayî armanca saziyê û pênasîya wê û rola wê ye. Di nava vê dîmena reş de, roleke girîng a Nivîskar û rewşenbîran dikarin bilîzin di tespîtkirin û belgehkirina binpêkirinê ji encama siyaseta çewt a PKKê de, û piştgirîkirina hejar û belengazan, dadgehkirina sûcdarên van binpêkirinê û dadgehkirina wan. Şeweyên parastina mafên mirovan cihêreng in û amûr jî ji hev cuda ne, lê gava yekem û ya herî girîng ji bo rawestandina binpêkirinê û sînokirina wan, belgehkirin û şopandine ku vegotina orîjînal a bûyerê li gorî radîyê tete gotin. Tevî ku rastî nexweşî bê, an jî kê rasterast di vê demê de bi axivê ji ber çend sedeman nekarî xwe bigihîne pirava rastiyê. Ya herî girîng ji van dibe ku kuştin an revandina xelkê bê sûnc, û dibe û buye qurban were nivîsandin û bi amûrên belgeyên cihêreng bête tomar kirin. Belgehkirina di vê Pirtûkê de pêvajoyek pir girîng, û bi pabendbûnek tund



ji belgehkirinê heye ku rêzê li qurbaniyan bigire û êşên ku bi wan re derbas bûne bi bîr bîne, ku bûne sedema encamên siyaseta PKKê ku wextekî pir bi zehmet derbas dibin. Pêvajoya bibelgehkirina rastiya mafên mirovan, di Pirtûkê de wek hewldanek e ji bo pirsîna binpêkeran, gihandina dadwerî ji bo xelkên li kurdistana Sûri û pêkanîna dadmendiyê, her weha armanca belgehkirinê teqeskirina rûdana şewazên binpêkirinê e ji bo amadekirina eşkerekirina siyasetek bi zanebûn li pişt van binpêkirinê. ku teqes buye ku binpêkirin li çend deveran qewimîye ji aliyê PKKê ve û gelek çaran dibe alîkar mîna dagîrkirina Efrînê û ji ber sedemek ne bûyerek veqetandî ye



Xwendinek di nava pirtûka "Hejal û Hevind" ya Luqman Silêman

Sedîq Şirnexî-Elmaniya

Yek ji kesayetiyan ku karîbûn di van çîrokên di vê pirtûkê de me vegehinin bi coşên xwe de li ew dema bav û kalan hinga ku alavên elektirîkî û eliktironî tune bûn, wekî radiyo û tilvizyon ku em dibînin niha derbas bûne her mal di bajar û gundan de.


Di wan şevanê gundiyan li ber agirên êzingan û rehnika luksan yan lempên gazê yan jê kevin tir li ber finda ku sibiha firnikên bihvila mirov reş dibûn ji dû û dûmana wê çira yê.

Di wan şevên dirêj û tarî de diva bû tiştê hebe kes pê mijûl bibe nexasim di şevên zivistanê ên sar û dirêj li odên gundan. Her şev li civata axê yan muxtar wek ferzên li mêjan amadebûna her gundîkî tekez biba, herger nexweş ba an rêwî ba. Dema ku ne dihat diva bû bi pirsê ka çima filankes ne li vir e îro, wek hijmara leşkeran ya rojane hebûna xwe bi cî bike, yan jî Xwedê zanê xwediyê gund çibkê jê.

Bi vê hawayî sîpên çardeh salî ta kalemêran di vê medresa(oda) jiyanê de ra dibûn, evê kevneşopiyê çi kir?

1- bû qutapxane ji xort û kesên vê sedemê re her nîşekî ev ser pêhatî yan çîrok du guhestin ji nîşên dî re, bi wêjî yek bûna hest û hilwestê kesyetiya kurd dibû yek li her pênc parçên kurdistanê. Bi saya vê tore û gotora me ya bi devîkî kurda yekîtiya xwe nasdikir ji başûr û bakur û rojhilat û rojava yê kurdistanê. Ji ber vê jî tu dibîni gelek nivîskarên me yên guh dane torevaniya kurdî çîrokên wek hev dibêjin, li serhedê yan li Şingalê yan li kurdistana sor.

Dema ku malbata Casimê Celîl di (zargotina kurdan de)piraniya van bûyeran tinin, yan jî Fetahê Tîmar di(çîrokên Serhedê)



de pir tiştê ku nivîskar Luqman Silêman anîne ziman bi diyalêkta wê deverê dibêje lê naverok û armanca kesê ji pêşîve ango ji kevnar ve gotî her yeke, di şîretkirinê de yan di terbiyetê de yan jî di belavkirina peyama axlaqî ji vê çîrokê re. 2- wek tê zanîn ev tişt dihatin gotin li cihê xwe de yan bi çîrokî û xweşkirin ji gel bêjerê çîrokê wek şanokî, ew jî ne her kesî di karî bibêjê ger ne hişmend ba di qûnaxa çend şevan li pey hev carna bêjê, wek kitêbek vekirî li ber çavên wî. Yan jî piranî bi sitiranî û awaz ji devên dengbêjan dihat ristin ev çîrok û şer. Li vir nivîskar zehmetîkî dibîne dema ku sitiranê bike têkista çîrokî wek niha kekê Luqman tede bêguman rehit bûye di hin danîna van çîrokan. 3- tiştê herî xweş di nivîsandina Luqman de ev zimanê wek çemekî yan kaniyekê di hereke ti jê tê nabê, ev taybetmendiya wi ye di destana (Şingal) de yan serpehatiya (Vîna Evînê) de em gav bi gav bi (Çeto) re dijîn bihestên wî re, hevokên wî zincîrek hev bernade ta ku tu bighê dawî.

Di vê kitêba wî de jî kariye me veguhêze etmosfêra her çîrokekî bi zimanê xweyê şêrîn wek ku em bi rastî beşdarin bi lîstikvanê van çîrokan re, di heman demê de dikare

me bi nirxa axlaqî ya çîrokê ve girê bide ev tê wê wateyê ku hilbijartina wî ji bûyerê re serkeftî bû dema ku peyama form û naverokê bi serkeftin radighêne.

4- wate û vegotinên wî çine?

Birastî dixuye ev çîrok ji demê dîr ve didê hev yan bi guhdariya kalemêran di nav wan de rehmetyê bavê wî û kesin din, wekî dî jî ji ber ku wî kasêten berê tomakirî hiştin, bi wan re girêdayî bû heya ku rojekî werin nivîsandin ji ber wilo wî xwe xwedan mirasek dewlemend a kultura meya kurdî didît. Wî dixwest zarokên nîfşa xwe bibin bi vî rengê ramana wi ya pirtûkê ku ew soz dida rojekî binvîsê rastî derket.

5- di herdû parçên pirtûkê de çi qîmet û daraz heye?

Di parçê yekê de hijdeh çîrok û serpehatî hene hin ji vna çîrokan xurî xeyalin çîroka van çêkirî serpehatiyên wê bo şahiyê di şevên zivistanê bibûre, mînak çîroka (Şahsiwar), hinek din zehniyet, mêraniya Ciwan mirovên kurd îfade dike (Mîrzo û Îzêr).

Ji aliyek din em çîrokên dilsozî û mehrebaziya bavan di bînin şîretên wan li zarokaan dikin(zilamek şehreza). Bi vî hawî çîrokên xemgîn(Xanê) û çîrokên dilşad berdewam

dikin, çîrokên ajala ku ji yekê zêdetir ser(Rovî), nivîskarên kurd û navnetewî pêre mijûl bûne lê disa jî bi zimanê Luqman pir xweş tîne bê guman çîrokên xiyanetê de dibûrin wek (Birahîm û Xelîl) yan jî (Heso).

Bê çîrokên evîni û fedakarî nabûrê(Fatima Salih Axa) yak û sitiran û şano ser çêbûne, beşa yekim bi çîroka (Hejal û Hevind) bi dawî tê ew jî bi sitiranî li herêma Botan tîne gotin.

6- beşê duyemîn a pirtûkê ew ji çarsed û ku tede şazdeh çîrok an enekdot tîne rojevê, ku ya herî giring (ewa Feqehê Teyran) a ji ber ku tede felsefeyek mîstîsîzmê hewil didê û tîgihîstinek kûrahiya vê felsefê û helwesta li hember aferîner, xweza û ramîna li ser xwezahiyê nîşan dide, hemî di bûrê di etmosfêra Cizîra Botan û ser dema Mele Ehmedê Cizîrî.

Çîrokên din berdewamiya vegotina tîkilyên civata kurdî(kurê pîrê) yan jî şerê (Hesen û Heyderan) di gel hin çîrokên dîsa xeyalî xweşik û sipehî (Silêmanê Silîvî) hin jî li ser tîrsonêka (Elî) her wiha şerên kurdan di nav xwe de şerê eşîran. Carna vedigere vegotinê dawetan de tîne ziman dîv re berdewam dibe bi berçavkirina pêşbirekên eşîran û şerê wan ku

hîn neviyên wan di nav medee dijîn, wekî şerê mala (Eliyê Yûnis) û qehermaniya wan, yan jî şerê (Bişarê Çeto) û mêraniya wî himberî dijmin.

Ev çîrokên yên ku heya niha di odên mayîn di kurdistanê bistiranî tîne gotin û ve dibêjin.

7- bê guman şewaza Luqman Silêman di vebêjeyê de bi zimanekî hêsane û pak û xuro wek ew pê hatî nasîn di nivîsandinê xweyî din de. Ku her yek li ber dikevê û ji peyvên dijwar ên ferhîngî dîr dikeve me dixê nav çîrokê ku hatine gotin li wê demê û civatê de, ji ber vê yekê ye ku merev wekî xwendevanek çîrokê bi nermî û bi hesreta bê navbir pêre dijî û di şopîne .

Di naverokê de em tekez dikin carek din ku ew dikare etmosfêra tevahiya bûyerê ragihîne him di çîrokek giran a felsefide mîna (Feqihê Teyran) yan ji yeka xeyalî wekî (Silêmanê Silîvî) an(pîra mirov xwer) her wiha di çîrokên henekan wekî (Eliyê newêrek) de û yên din di destana (Zembîl Firoş)de.

Zimanê ragihandinê yê soberî di dawetên Kurdî yên kevin.

Di dawî de, ew me digihîne heman coşê ya ku wî xwestiye di pirtûka xwe de bêjê û serpehatiyên mîletê me bi tevayî.